# WINDA

DILAZAD ART



Weşanên Zaningeh

# WINDA

DILAZAD ART

2012
Zaningeh, Stenbol

**Zanîngeh** : 18
**Kurdî** : 08
**Helbest** : 08

**WINDA**
**Dilazad ART**

**Editor:**
Ridwan Xelîl
**Bergsazî:**
Zanîngeh Media
**Wêneyê Berg:**
Mahmud Islam
**Rûpelsazî:**
Ridwan Xelîl
**Redaktorya:**
Nûpelda
**Pisporê Zanistî:**
Gulîstan Azad
**Çap:**
Çapxaneya Zaningeh a Dijîtal

**Navnîşana Daxistina Pirtûkê**
http://www.zaningeh.net

Bo Na Pêwendî, Peşnîyar,
Rexne û alîkirina We:

**Dilazad ART :**
0 505 235 53 24
dilazadart@gmail.com
dilazad.wordpress.com

**Ridwan Xelîl:**
0 505 638 61 33
ridwanxelil@gmail.com
ridwanxelil.wordpress.com

**Zaningeh**
zaningeh.net
zaningeh@hotmail.com

Çapa Yekêm
**Zaningeh**
Stenbol, 2012

Hamû mafên pirtûke ji alîye nivîskar û weşanxane hatinê parastin. Bêdestura nivîskar an weşanxane bi tu avayî hemû pirxûk kopînabe, belavnabe û hwd.

Bi awayê ku çavkanî werê nivîsandin hûn dikarin jiberbigirin.

## Jiyannameya Dilazad A.R.T.

Berpirsyarê Giştî ê Zanîngeh Media

Li ser çand, hûner û wejeyê dixebitê. Nivîs, helbest û lêkolîne nivîskar ê bi Kurdî û Tirkî di kovarên cihê dê bi Kurdî û Tirkî û di malperên cihê de hatine weşandin. Di bin sîya Zanîngeh Media de xebatên dokumenterî, klîp û filmên kurt amade dike.

Bi zimanê zikmakî re (Kurdî) dizanê zimanê Tirkî û Îngilîzî jî.

## Berhemên Dilazad ART

### Berhemên Kurdî

1- Destana Evînê, 2010
2- Ramanên Azad, 2010
3- Tûrik, 2011
4- Winda, 2012

### Berhemên Ku Wergerandine Kurdî

1- Rîsala Aborîye, 2010
2- Wateyên 12 Suretên Qur'an a Pîroz, 2011

### Berhemên Tirkî

1- Nûpelda'ya Ağıt, 2001
2- Taşa Yazı Yazmak, 2010
3- Kurşunlar Yürek Ağlattı, 2011
4- Yolcu, 2011
5- Şagird, 2012
6- Başkaldırı Şiirleri, 2012
7- Dijle'nin Çocukları, 2012
8- 35 Bomba Roboskî, 2012

# Naverok


WARÊ ME ........................................ 11
WELATÊ ME ........................................ 14
RÊNASÊ ME ........................................ 15
EZ TERORISTIM ........................................ 16
TEKOŞÎN ........................................ 17
DILÊ MIN ........................................ 18
TI ÇÛY EZ HÊRIVÎM ........................................ 20
HELBESTVANE JIYANE ........................................ 21
AMEDÊ ........................................ 22
WERE ........................................ 23
EY DIJMINÊN XWÎNXWAR ........................................ 24
AXA ME ........................................ 26
TU BUY BIHAR ........................................ 27
RAZ ........................................ 28
ZINDAN ........................................ 29
BERÎVANA MIN ........................................ 30
TU WERE ........................................ 32
NE BÊJE ........................................ 33
GERDENÎ ........................................ 34
EVÎN ........................................ 35
BEHNA EVÎNE ........................................ 36
HÊVÎ ........................................ 37

TU Û BIHAR ........ 38
PIRTÛKA WINDA ........ 39
KEŞTÎYA DAWÎ ........ 40
VEJÎN ........ 41
KOÇBERÎ ........ 42
BEDO BIRE MIN ........ 43
TÎ ........ 44
ARAF ........ 45
XWÎN ........ 46
BERÎKIRIN ........ 47
TU Û ŞERAV ........ 48
HAL PERÎŞAN ........ 50
DILŞA ........ 52
SERXWEŞ Û MERXAS ........ 54
PÎR ........ 55
XEZALA MIN ........ 56
ÇIBIKIM ........ 57
BERÎKIRIN ........ 58
ROJAVA ........ 60
NERÎN ........ 61
MIROV ........ 62
ZAROK ........ 63

TÊLÊN ZINGARGIRTÎ ........ 64
BEXÇÊ GULAN ........ 65
JİYAN ........ 66
EZ Û TU ........ 67
TU NEHATÎ ........ 68
NISÊBÎN ........ 69
YUSUF ........ 70
ŞÊRÎNÊ ........ 71
HÊT Û PIR ........ 72
KESER ........ 73
PENABER ........ 74
YAR ........ 75
EVÎNA DEREWÎN ........ 76
KERBELA ........ 77
BEJN Û BALA TE ........ 78
WELATÊ ME ........ 81

Ez Ve Pirtûke

# Dîyarî

Aşîtîxwazan Dikim...

## WARÊ ME

Xortê me zavayê salê bûn
Keçê me bukên salê bûn
Bexde û Tahran kerr û korbûn
Enqere û Şam bê ol û bê rûmetbûn

Zarê me an sêwî an birîndarbûn
Jin bî bûn an bi girî û bi qîrînbûn
Jiyan li Kurdan geh jahr bû geh xedarbû
Gelê cîhanê li Kurdan çavgirtîbû

Çar gurê har erîşî berxa kir
Herkes li hember berxa doz kir
Dîrok û war hate talan kir
Nav û merxasîya Kurdan weran kir

Navê Kurd, Ereb û Fars û Tirk kirin
Bi top û tang û balafira Kurd qîrkirin
Ax û welatê Kurd dinav xwe de parkirin
Her mafxwarekî ê dî malavakirin

Koçberbûm ji gund û bajarê xwe
Bûm parsek û karker, wek şahbûm li warê xwe
Gelek Kurd windakirin binyada xwe
Înkarkirin bi devekî hebûn û jiyana xwe

Çelpik lêxistin ji xwinxwarê xwe re
Neyartî kirin bi awayekî dijwar bi gelê xwe re
Dagirkera hemû xweşî birin ji xwe re
Hemû gencinîye me alistin, tiştek nehiştin ji me re

Ya Rabb Tu dermankê birînê me
Dilazad im êsîrkirin em, azadbike me
Wek her netewekî rizgarbike welatê me
Desthilatîye, serdestîye bide me

Ɛy gelê bindest, bi navê Ɛllah newe xapandin
Ji bo bibînê rastîye, bike herdem xwendin
Ji dest bernede şûr û mertalê zanîn û hunerê
Hişyar be, xwe gêjneke wek kesê ne li rê.

03.10.2008 / Nisebîn

## WELATÊ ME

Ax û nalîn, şahî û kamranî
Her dem xwe li Kurdistan danî

Sewas û Xarput û Meletî û Mereş
Jiyan li Kurdan xistin tarî û reş

Kilîs û Dilok û Osmanîye û Semsur
Hatin xwarin mîna berxê li ber gur

Dersîm û Erzincan û Erzirom
Ji Kurdewarî xistin wa Rom

Erdixan û Qars û Idir û Çewlîk û Agirî
Gelek dê û bav hatin girî

Riha û Merdîn û Amed û Êlih û Şirnax
Talan û weran kirin ev ax

Sêrt û Colemerg û Wan û Bedlîs û Muş
Jiyan li mirovan xistin demuş

02.10.2008

## RÊNASÊ ME

Seyda û mamostê gel Xanî
Danî bingeha Kurdistanî

Pîrê evînê, şahê helbestê Cizîrî
Xweş û zelal kir şerbeta me wek ava tirî

Firî li seranser welat Teyran
Êş û kulê me kire stran

Dengek da û çû Herîrî
Awazek xweş danî ji me re mîrî

Evîndarê peyxember Bateyî
Rênasê me her tu yî

01.10.2008 / Nisebîn

# EZ TERORISTIM

Ger xwestina mafen mirovan,
Ger axaftina zimane maderî,
Ger jiyandina ol,
Ger jiyandina tore,
Ger xwestina şahîyan,
Bi nave terorist navdarbe ez teroristim.

Ger xwestina azadiye,
Xwestina dadîyê, biratîye,
Xwestina gereke azad,
Xwestina jiyaneke di welateki azad,
Bi nave terorist navdarbe ez teroristim

12.04.2005

## TEKOŞÎN

Ez li berxwedidim
Li hemû bajaren bûne nîşana berxwedane
Ez serhildidim
Li hemû bajaren bûne nîşana serhildane
Di hemû tevkujiyade ê te kuştin ez im
Di hemû haware bêçareyan da ê bê çare ez im
Bi hemû mirovên bindest re ez bindestdibim
Bi mirovên birçî re birçî
Bi ê tazî re tazî me
Bi wan re digirîm
Bi wan re jan li min dixe.
Dijminatîya kesî nakim
Dijmine zalima me.
Ji bo gezik nan nabim parsekî zilme
Birçibûn rûmettir e ji têr xwarina nane zilme
Çar alîye jiyana min hatiye girtin
Her çiqas bedena min girtîbe jî
Azada dile min, azada raman û canê min.

24.10.2004

## DILÊ MIN

Carna dibim Xanî
Ji nûjen di nivîsenim Mem û Zîn

Dibim Teyran
Dijle ji min re dibe heval

Dibim Cizîrî
Ji nûvre evîndar dibim

Dibim Selahaddîn
Ji nûvre distenim Qudsa Pîroz

Dibim Rustem
Li hembere zilme

Dibim Kawa
Li hembere Dehhaqan

Di vegerim dema xwe
Ji nûvre di nivîsenîm evîne
Ji nûvre evîndar dibim
Li hembere zilma zeman im
Her roj ez dikujim sed Dehhaqî
Her roj bi şûrekî tûj li dile zilme dixim
Ez hatim xilaseke
Le ne zilm xilasbû,
Ne jî Dehhak
Çend cara em xeniqandin Dijle
Çend cara em berdan evîna me
Em bûn Mem li benda Zîn
Le Zîn dil da biyanîya
Heyfa meranîye
Heyfa vê êş û jana me

10.11.2004

# TI ÇÛY EZ HÊRIVÎM

Gul dinav bîstanada bibehn
Bilbil di gûlistanda dilşa
Xweşe roje bi te re
Be te xweşî jan û êşe
Xweşî hebe bi te xweşîye
Bi dîtina te dilşa me
Hebûna nave min bi hebûna nave te ye
Bi tinebûna te ez dikevim.
Ti çuy ez herivîm

07.02.2005

## HELBESTVANE JIYANE

De rabe ji xewa giran
Rabe paqijke çaven xweyî kenîştî
Bixwene dîroka mirovatîyê
Jîn bike hemû mirovan
Tu ne mirîyî ranekeve veke mirî
Dê û baven te xwe helandin
Fernebûn wateya jiyane
Tham nekirin ji xweşiye jiyane
Ey zaneye rewşenbîr
Tu xwe na şewitêne
Ku gel bi şewta te ronîbibe
Ey evîndar
Tu dîn û har be li ser evîna xwe
Ku gel hevîya evîne bike ji te

07.12.2004

## AMEDÊ

Ez li bin sîya bircên Amedê diqufilim dayê
Dîsa dengê panzera bi ser dengê zarokan ket dayê
Di kolanên tengde ez bi tenê mam
Li ser bircên Amedê nivisîye dîroka me
Ma tu dibe çima reşbûn ev kevir
Ji jan û kesera reşbûn kevirên spî
Tu dibîne dayê ava Dijle bostek e
Kanî ew xuşa xuşa çemê Dijlê dayê
Xemgin diherikê bêdilê xwe
Disa banga mela tê guhe min
Disa kuştina zarokeki belavdibê li nav bajar
Qîr û hawarên jina zilamê bajêr digirîne
Tev li benda biharê ne, jin, zar û zilam.
Bihareke azad
Bihareke bi coşa newrozê.

13.12.2007

# WERE

Were ê dî dile min
Were ê dî cana min
Bê te naye hedana min
Bê te ez birindar im
Were ê dî dermanê min
Were ê dî neçe gula min

# EY DIJMINÊN XWÎNXWAR

Ey dijminên xwînxwar
Vaye hatin Kurden bi dirok û war
Her yek wek şêr û pilingan
Natirsin ji mirin û top û tifingan

Bi kuştinê nayem windakirin
Bi talanê nayem werankirin
Roj bi roj bilindibe ala min
Geş û ronî dibe peşêroja min

Zar û jin û mer û pîr
Her yek mîna kevan û tîr
Azad jiyane li ser çiya
Ji bo azadî sond dana dîya

Nayê bendkirin dest û pîye şêran
Şêr şêre, çi jin çi mêr e
Binvisene ey dîrok vê stranê
Da xilasbê welat ji talanê

İman anîye bi olê Rabbê Alemîn
Ders xwendiye ji Qur'ana Kerim
Nayem kolekirin, nayem bindestkirin
Serfîraz im, serbilind im nayem qeydkirin.

20.10.2008 / Nisebîn

## AXA ME

Axa me bû Kerbela
Wek Kerbela bi xwînbû
Û xwîna me divexwartin zaliman
Bêser diman bedenên axa me
Û ji alîyekî jî jana bêçarêtîyê em dikuştin.
Dîsa em bi hêvîbûn ku rojekê
Ye hilweşê saltanat a zaliman.

23.10.2004

## TU BUY BIHAR

Tu bûy agir
Em şewitandin
Tu çûy
Em bûn xwelî

Tu bûy bihar
Tu hatî, te em şînkirin, jîndarkirin
Tu çûy em hişk û ziwa man.

07.05.2005

# RAZ

Her kî bigihêjê razên rastîyê
Gelek tiştê nebûyî yê bibînê
Car caran sosret dimênê
Û xwe ji nû ve nasdikê
Dil dixwazê bifirê lê bê bask e
Yek bi yek radibin ji ber çavan perde
Rastî geh li asîman a geh li erdeye
Ger tu çaven xwe miçkê
Tê ronîye li ber xwe reşkê
Nebê ez nezanim ey mîrê civatan
Kar bixwehdan û bikedêye

Cin di alema nexuyanîde
Raz li ser raza raz e
Gelek zanin nayen zanin
Gelek nezanin te zanin

19.05.2005

## ZINDAN

Di zîndanê de
Min qesr avakirin
Di dilê xwe de
Ji bo te

02.07.2005

## BERÎVANA MIN

Heyle le le...........
Pezême bê bêrî maye heyle le........
Heyfa bêrîvana min ku îro ketiye deste biyanîyan
Berxik û kehrik bê şîr mane
Di gûhanê mîh û bizina de şîr nemane
Şev û roj bi bilurê dilorînim
Lê îro çiya bê bilur mane
Ez bê bêrîvan mame heyle le...........

Ax bêrîvanê, dermane kul û derdaye
Ax bêrîvane, dew di meşka min de nemaye
Tû dizanê dile min li ser te heye
Ji bo te bû ewqas kişandina jan û êşaye
Lê îro ez bûme xerîbê bêrîvana xweye
Lawike biyan çi zanê qîmete çaven rêşî belek
Çi zanê tahma levên hingivkirî
Çi zanê qîymete wan destê ji şîr sipîtirî
Heyfe ku keçemêr dikeve deste nezanaye
Heyfe ku durr û mircan
Dikevê nav hesine zingargirtîye
Ku hêyva çardeha bikevê paşila tarîtîyê
De heyle ...... Le............
Bêrîvana min le...

21.05.2005

## TU WERE

Tu werê
Di dile min de
Welatên bindest yê azadbibin
Tu werê
Di bexçê girtigehê azadxwaza da
Gûl û sosin yê vebin
Tu werê
Ye hêrivin pûtê di dile min de
Tu werê
Nûjen yê avabibin şahrê kevnare
Yê azadbibin gelên ku li berxwedidin.

09.07.2005

# NE BÊJE

Xwedê azad afirandime
Ê go min koledike kîye
Dîtin heye li ser dîtine re
Bihîstin heye li ser bihîstine re
Tham heye li ser thame re
Meyzandin heye li ser meyzandine re
Ne bêje ez zanim
Zanayek heye li ser hemû zana ra
Ne bêje ez ez
Li hembere em binketi dibe ez
Ne bê min dît
Ji dîtina te durtir dîtinek heye

18.02.2005

## GERDENÎ

Ti gerdeni naxemilenê gerdena te
Heyva çardeha ji te ronî digre
Bê qimet dimenê li ba te durr û mircan
Ne go cile li te xweşikin
Ji bo li te ne xweşikin

12.03.2005

# EVÎN

Ah dilketya min
Her tu tê bîra min
Agir dikevê dilê min
Çavetey reş û belek
Agir xistiye dilemi gelek
Çend sal çêbûn ku tu çûy
Wek dohoye çûbûna te evîna min
Ziwabûn çavemin de hestire min
Tû çuy ne kenî ev dile min.

20.03.2001 / Sêrtê

## BEHNA EVÎNE

Behna evîne
Behna xwehdanê
Û behna deng û dengvedanê
Jiyaneke girêdayî tayê zirav
Di hembez û gerdena yarê de
Xelat û diyarîya temenekî bi jan....

10.11.2007

# HÊVÎ

Hestiren spî herikîn
Li ser lame min î reş
Hestiren germ herikîn
Li ser laşe min î sar

Û piçikî hêvî
Ket dile min
Ji hemû mirinan
Ji hemû herivan
Ji hemû ketîyan, birinan

## TU Û BIHAR

Tu were bihar newe jî çedibe.
Hatina te zivistane dixe bihar.

30.11.2004

# PIRTÛKA WINDA

Di hemû pirtûkên windayî de tuyî
Di hemû xezîneyande ya hilanî tuyî
Bi sala ya le hatiye gerandin tuyî
Ya ku dixwazim tuyî
Ya windayî tuyî
Tu hem bi min re yî hem durî min î

19.01.2005

# KEŞTÎYA DAWÎ

Xwe bigehene keştîya dawî
Bazda mîna pilingekî
Ji dest bernede
Ev keştîya talîya
Hemû heval têdene tu le kemî

23.01.2005

# VEJÎN

Û Xweda mirov afirand
Ziman, dil û mejî da
Ji axe û can vejand
Raman da, hiş da
Û diroka mirovahîye destpekir
Bi Adem û Hawa meşa jiyane destpekir
Barekî giran kete ser mile mirov
Habîl bu mazlum
Qabîl bu qatîl
Û mirov bi rijandina xwîne hevnasin bûn
Xweda raz da ser raz
Şeytan bi mirov re hemdembû

23.01.2005

## KOÇBERÎ

Ax le dinyaye
Disa koçberî kete peşîya me
Bajarên kevnare dibin zilme de maye
War ji mirovan vala maye
Ê hate kuştin û ê hatîye birindarkirin

## BEDO BIRE MIN

Bedo biraye min
Te di go merdbe
Ê merd di jiyane de bi kar dertên
Bûm merd Bedo
Lê min windakir Bedo
Windakir hevîyen xwe
Windakir hemû rûmeta xwe

# TÎ

Tu li min nemeyzêne
Ku di nav avê de me
Di nav avê de me lê tî me.

# ARAF

Ez mam di arafêde
Hem ji behişta te
Hem ji cehennema te sirgun bûm,
Sirgun bûm ji dile te.
Fermana min nivisiya te
Li ser mirina min
Ez bi deste te te me kuştın
Ne havceye kêr û xençera
Evinate parpar kir cane min

Min ji te hezdikir bi dizî
Tu ji min bêxeber
Ji bo te roje roni xeyal dikirin
Ji bo te bu hemû kar û xebate min
Te famnekir
Ji evina mın, ji hale min
Le min ji bo te ster di jimartin
Di her sterke de nave te dihate nivisin
Tu bêxeber buy

17.06.2004

## XWÎN

He qete goşte me
Xwine me bi telê dirah veye
Jibîr nekin be çi anîn serê me
Em xistin çi halî

30.06.2004

# BERÎKIRIN

Veke dilê xwe ji evîna min re
Veke pêsîra xwe ji ramusanên min re
Veke çavên xwe ji awirên min re
Em zaroken xizan bûn
Bê destek û bê piştgirîbûn
Bi dil û can bi xweşhêvîbûn
Dilgirtî û diltengbûn
Jiyan li me bi xedar û xemgin bû
Dil ji min bir dil ji min bir
Te ez perîşan û dilkirim
Te ez dilşewat û dilbixwin kirim.

## TU Û ŞERAV

Westiyam ji derde te
Ey şerbetfiroş
Tu li hale min meyzene
Ez ji derde tilopek şerbet
Ketim nav kul u êşa
Bese ev kuştina te
Ka dagra ve şuşê
Ez wexûm bi hişbibim
Ne go serxweş dibim bi şerbete
Ez be şerbet serxweş im.
Êşa min bêşerbetiye
Dermane mın şerbeta kevin ya salaye

Çav xezala min
Bejin zirava min
Rûheyva min
Xuyani dike di tilopek şerbete de
Ez dibe evin,
Şerbet dibeje ez
Ez mama dinav xwe û xwe de
Dibejin min tu dîni
Le bele ez dîn im
Hem dîn û harim
Hem aqil û evin li ba hev çena be
Ji evindar re lazime bêaqiltî
Evin ne kare şiyara ye
Hem raz a
Hem kare dîn û haraye.

01.07.2004

## HAL PERÎŞAN

Êdî dîrok ber xwe vekê
Di nav pelên tozgirtî de
Pênuseke şikestî
Nivîsandineke qirêjî
Li ser halê me hatî nivîsandin
Ez çi bibêjim
Hal perîşan, hal kambax
Hê bindestê zilmane
Hê birîndarê bomba û guleyane..

Çend demsal e bêbihar bihurîn
Min nedîtîn tu bihar
Di germa havinî de diqufilim
Di serma zivistanêde diperitim
Xweşe bê yarî heta temenekî
Li ku dem hat her rojeke bê yare
Mîna pelekî ji salname diweşêye
Hiş di serde namînê
Hişyar raketî, raketi hişyarin
Nizanim ya ku vedixwim ave an şerava
Nizanim serxweşim an bihiş
Nizanim çep e an rast e
Bihna gula hem zehferane
Şev hem bi girî û hestirane

18.06.2005

# DILŞA

Di şevên reş tarî de
Di şevên behna çek û tirsê de
Di qîr û haware jinepîra de
Di bêdengîya tenetîye de
Tenetîyeke bi milyon kes
Di şeveke ku heyva bi ewra perdekirî
Ewrên reş ewrên tarî
Di bin qedexeyên salan de
Di berbanga melaye nimeja sibehê
Ku dengê mela, mîna kevokên di kafesê de
Bi dilşewat, bi dilxemgin
Hêvîyek kete dile dinye
Hêvîyek jidayîkbû
Di nav axeke ku bi xwîne şuştî
Û di nav xwîne de dilivî
Bi girîkî serhildan
Tirs ditirsîya ji hatina azadîyê
Bi girîkî hêvîdar hat Dilşa
Ji salê payîz bû
Mîna rojbûna her Kurdekî
Ku bênasname, bênav û bê welat
Dilşa tu bi xêr hatî
Bi xêr hatî heyva çardeha
Bi xêr hatî ronîya dê û bavê xwe
Dizanim jiyan dijwar û hove
Lê destanbûyîn ne hesane.

Roja tu çêbûyî
Qedexebû zimanê te
Qedexebû nav û jiyana te
Qedexebû hebûna te
Berîya te hilweşandin warê me
Kuştibûn zaneyên me
Girtîbûn merxasê me
Parçekirîbû welatê me
Nayê gotin derdê me
Nikare binvîsênê pênûs
Bê çare dimênê helbestvan
Ziwadibê hibra hişê min
Tenê xwina min dimenê
Bi xwinê dinvîsênim nave kujerê xwe
Were were dergahê
Tê bibînê ilm û îrfanê
Dergaha me, dergaha hêvîya ye
Bêhêvîtî dûrî me ye.

28.02.2012

## SERXWEŞ Û MERXAS

Li meyxane serxweş û sekran im
Li meydane merxas û egîd im

# PÎR

Pîr hate meydane
Ronî da cîhane

## XEZALA MIN

Delala min
Bi hevîya rojên geş
Bi ronahîya biharên xweş
Bi armanca jiyaneke azad
Dibin siya asîmanan de ez dilketim te
Li ser axeke paqij ez dilketim te

Xezala min
Ez dizanim derya dûrî welatê me ne
Kulilkên me zû hişkdibin
Rubare me zû diçikin
Lê çibkim Xezal
Em li benda barana bihare bûn
Guleyên zingargirtî li ser me barîn
Em li benda azadîye bûn
Bend bi ser me de weşîyan

# ÇIBIKIM

Evîndarêkî dilgeş im
Bi biryar û sond im
Ger evîn nehêja bê
Dilazad im çi bikim

Ger karker ne jîr be
Hosta çi bike

Ger xwendekar fêmkor be
Mamoste çi bike

Ger ferman bedad be
Mazlum çi bike

## BERÎKIRIN

Veke dilê xwe ji evîna min re
Veke pêsîra xwe ji ramusanên min re
Veke çavên xwe ji awirên min re
Em zaroken xizan bûn
Bê destek û bê piştgirîbûn
Bi dil û can bi xweşhêvîbûn
Dilgirtî û diltengbûn
Jiyan li me bi xedar û xemgin bû
Dil ji min bir dil ji min bir
Te ez perîşan û dilkirim
Te ez dilşewat û dilbixwin kirim.

Ez ji te hezdikim mîna Amedê
Kelha berxwedanê me mîna Hewlerê
Civan im serbixwe me mîna Mehabadê
İro konê Zîn bi talane
Be şivan û bê berîvane
E ku hat di gotin
Em xwedî û tu mevanî
Zozane min parkirin li xwe
Zîn, rabe ser xwe
Çendî xew şêrîn û xweş e
Le namus weran bû
Bişo xwe ji we nexweşê
Bi şîrê di pesîra te de
Xwedî bike bîr û ramana
Şîrekî helal, mîna hingiv

# ROJAVA

Çukurova pembu û sêv û portakala me
Derya Reş findixê me
Ege tûtin û tirîye me
Metrepol kargehe me

## NERÎN

Çolbû di çaven min de Erebîstan
Newalekbu Mekke
Deştekbu Medîne
Bi hesreta avêbun çol
Ey barana bi rahmet
Bibare bi ser deşt û çole me
Bi hêvîne ji ewrê te

10.04.2006

## MIROV

Ez mirov im mirov
Ez im ê ku li dadgehê engenizyonê de
Ez im ê ku tê darizandin
Bê suç û bê sedem

## ZAROK

Ez zarok im
Bedena min tê helandin
Têm kuştin.
Bê pirs

## TÊLÊN ZINGARGIRTÎ

Dîsa têlên zingargirtî xwinî kirin destên min
Dîsa li pişt têla maçkirin destê dê û bavê xwe
Wek şurekî tuj em ji hev qutkirin.

## BEXÇÊ GULAN

Bexçê gul a
Bi rengê sorgul a
Warê şalul û bilbil a
Helîna evîn û dil a
Şerîn û xweşe hezkirina bi sal a

Ne kevir û zinar
Ne gelî û şihar
Jibîrnabê ew war
Ne asîman û ne diyar

# JİYAN

Ê dî ez hew xwe dikujim
Her çiqas min xwe dikuşt
Devbixwîn her dikenîyan
Ê dî ezê bijîm,

# EZ Û TU

Tu yî gul û gulistana min
Tu yî derd û dermanê min
Tu yî şerîna dile min
Tu yî per û baskê min
Tu yî çavreşa min
Ez im evindarê te...

## TU NEHATÎ

Roj derbasbûn tu nehatî
Bi hevîya dîtina te bûm
Şiyarbûm ji xewên xweş
Şikestîn xewn û xeyalê min
Tu xwedî warbuy ez xerib bûm
Tu nehatî ez xeyalşikestbûm
Tu nehatî her der li min tarîbû
Tu nehatî jiyan li min qedexebû
Ez li benda te bum
Tu min li kolanan li çiya û li deşta bigere
İro ez bûme av, ji agirê zilme re
İro ez bûme top ji kelha zordariye re

## NISÊBÎN

Gûlilka nava Nisêbîn
Di vebû mîna bihar
Kevok difiriyan serê çiya
Dengê gula dihat guhê me
Tirs durî me bû, mirin nêzîk
Çend caran dil bixwînbûn
Çend caran dayîk girîn li ser me.

2000-2001 / Sêrt

## YUSUF

Yusufê di bîra kûrde me
Mîna kola hatim firotin
Ketim zîndanên qesra
Xewnen azadîye şirovedikim
Li benda devra sultanîya xwe me.

25.09.2005

## ŞÊRÎNÊ

Thama lêvê te wek sêvê gihaye
Thama sîngê te wek şaraba salaya
Şêwqa rûyê te heyva çardehaye
Çavête reşin wek şevaye

29.09.2005

## HÊT Û PIR

Min hêt (dîwar) avakirin
We herivandin.
Min pir avakirin
We xerakirin.

21.10.2005

# KESER

Ax û sed carî ax
Ji derdê hesretê
Her fîraq bû kulek
Min derman xwest ji dilberê
Da min maçek û xencerek
Hiş û aqil nema
Bu kevok firî êş û kul
Maç bi rûye min
Xencer li dile min ket.

26.06.2007

## PENABER

Bûme penabêrê dilê te
Roj bi roj cîh girt
Mîna dara çinarê
Ra girt di dilê te de

26.06.2007

# YAR

Tîrên çaven te
Derman kirin birîne min
Awirên te yî sosret mayîn
Dilgeș kir ev can û bedena min

Ey heyva çardeha
Bendbike rûye xwe
Ma tu nabînê
Yara min derketîye seyrana șevê.

26.06.2007

## EVÎNA DEREWÎN

Ê ku danê sibehê bi hevre yar in
Danê êvarî ji hev re dijminê har in
Ê ku îro di destê hevdene
Roja dîn di destê hine dîn de ne
Tolaz û doxînsistin
Li ber nefsa xwe kolene
Şerm nakin jê re dibijin evîn

21.03.2010

## KERBELA

Çibikim her dever bûye Kerbela
Her meh bûye Muharrem
Dîsa Yezîd hatin serserê me
Ey şehrîban rabe ser pîya
Ey zûlfîkar
Bikuje ji nûjen ve zilma Yezîdan

# BEJN Û BALA TE

Te yê kirasê xwe li xwebikê
Bejna xwe bi durr û mercana bi xemilênê
Porîka xwe bi şehê zîv bişkinê
Kembera zêrîn li bejna xwe bipêçînê
Gerdenîya Merdînê li gerdena xwe ve bikê
Wan çavên xweyî belek bi kilbikê
Hedî hedî te yê xwe berdê serê kanîye
Tû ye cêrê xwe ji ava spî dagirê
Ger ez dereng bimenim tê li benda min bisekinê
Çaven xwe li min bigerênê
Ezê ji nav mala derkevim
Berê xwe bidim zozanê gundê me
Tû şerm nekê, li min meyzebike
Da carê bi çavê rojê bibînim bejn û bala te
Da bibînim van çavên te yî mêrkuj.

04.01.2008

**WELATÊ ME**

Ax û nalîn, şahî û kamranî
Her dem xwe li Kurdistan danî

Sewas û Xarput û Meletî û Mereş
Jiyan li Kurdan xistin tarî û reş

Kilîs û Dilok û Osmanîye û Semsur
Hatin xwarin mîna berxê li ber gur

Dersîm û Erzincan û Erzirom
Ji Kurdewarî xistin wa Rom

Erdixan û Qars û Idir û Çewlîk û Agirî
Gelek dê û bav hatin girî

Riha û Merdîn û Amed û Êlih û Şirnax
Talan û weran kirin ev ax

Sêrt û Colemerg û Wan û Bedlîs û Muş
Jiyan li mirovan xistin demuş